

Birêz Mistefa Hicrî di doma gera xwe ya ji bo derveyî welat, li Fransayê bi gelek kesayetiyan mezîn yê wî welatî re hevdiîtin pêk anî. Her wiha çend rojan berî niha rêzdar Mistefa Hicrî bi rayedarên bilind yê Parlemana Ewropa re ji hevdiîtin pêk anî. Agahiyê pêtir li ser malpera me bi dest bixin... **Rûpela 9**

**Kirîna Demê Heta
Gihîştin Bi Çeka Etomî**



Siyasî R. 2

**Pîroz Be 27'ê
Cozerdanê, Salvegera
Avakirina Dengê
Kurdistanê Îranê**



Siyasî R. 2

**Demokrasî, Biha û
Piratîka Wê**



Siyasî R. 6

Serdemê Dayîk Serdestiyê



Civakî R. 8

BIYANÎBÛN



Çand R. 10

Li Parîsê Konferansek navneteweyî li ser Pêşeroja Îranê

Roja 16.06.2006'an, konferansek navneteweyî di bin navê **Îran ber bi kuderê ve diçe** di yek ji holên Parlemana neteweyî ya Firansayê hate lidarxistin. Ev konferansek bi alikariya biroya nûneriya PDK Îranê li derveyî welat û bi hinceta sefera birêz Mistefa Hicrî, sekreterê Giştî yê PDK Îranê ji bo firansayê û bi cehd û hewildanê cihê rêzê yê Enistîtûya Kurd li Parîsê hate pêkanîn. Basên bingehîn ên konferansê bi ser sê mijarên jêr pêk hatibû:

1. Civaka Îranê ya îroyin
2. Pîrsa neteweyên ne Fars
3. Helwesta demokrasiya Rojava li hember pêkanîn, kiriz û bernameya Etomî ya Îranê.



*Mistefa Hicrî û Dr. Kendal Nezan di
Konferansa Parîsê de*

Li ser wan sê mijarên bingehîn yê Koneferansa han gelek kesayetiyan Kurd, Îranî û Ewropî axivîne. Rapora berfireh ya Konferansê li ser malpera me bixwînin:

<http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/nuce/file/13.php>

**Hevpeyvîna "More SEMO",
Nûçegihanê Rojnameya "Liberation"ê,
Tevî Birêz Mistefa Hicrî,
Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê**



Siyasî R. 3

Birêz Rostem Cehangîrî:

**"Rasîzm Nagihêje Astekê Ku
Rêberiya Her Du Gelên
Kurd û Azerî Bi Dest Ve**



Hevpeyvîn R. 4-5



**Ji Olên
Mirovatîyê
Ola Konfûsiyos
R. 9**

Kirîna Demê Heta Gihîştin Bi Çeka Etomî

Pîştî pêşkêşkirina pêşniyarên hayder ên welatên Ewropayê bi rejîma Îslamî ya Îranê û neçarbûna Dewletên Yekbûyî

yên Amerîkayê ji bo qebûlkirina gotûbêjên mercdar tevî rejîma Îranê, dîsan jî delîveyeke din ji bo bidevaneîna demê ji bo vê rejîmê pêk hatiye.

Rejîma Îslamî ya Îranê ku hetanî niha jî bi tu awayekê neçûye bin barê daxwaziyên Amerîka û hevalbendên wê yên Ewropî, ji aliyekê bi veguhastina vê binbest û dijheviya kurd Konseya Ewlekariya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di holê de ye û ew guhartina rêjeyî ya di helwesta Koşka Sipî de çê bûye, dîsan mijûlê xapandina civaka navneteweyî û domandina siyaseta diyalog ji bo gotûbêjê û aqibetkirîna demê ye. Taktîka herî nû ya rejîmê di vê derheqê de pêkhatiye ji daxwazkirina derfeteke ne diyarkirî û gelalekirina komek pêşniyaran li hember wan pêşniyarane de ye ku çend rojan berî niha Xawiyer Solana ji aliyê welatên 5+1, bi navê besteya pêşniyarên hayder pêşkêş kiribû. Diyar e eva ku di vê derbarê de ji çavê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ne veşartî ye, tenê çavniher hêlana wan û dîrxistina her çiqas pitir ya civîna Konseya Ewlekariyê û ji rêya vê yekê ji bidesxistina demeke pitir ji bo domandina bernameyên Etomî yê

Ebdula Behramî
Werger: **Azad Kurdi**



ber guman e û bes.

Her çend ne ron û zelal e ku bersiva serokên rejîma Îslamî bi pêşniyarên Ewropiyan dê çi bibe û gelo rejîm bi qebûlkirina vî mercî, wate sekinandina bernameyên xwe ên Etomî, dê tevî Amerîkayê bikeve gotûbêja du alî yan na? Lê belê li vir jî ev gumane gelek xurt e ku rejîma Îslamî ya Îranê bi qebûlkirina westandina demekî ya bernameyên Etomî ên xwe û destpêkirina gotûbêjên rasterast bi Koşka Sipî re, vira jî dê tenê armanca bidevaneîna dem û wext hebe û bes. Çûnkî eva rastiyek e ku rejîma totalîter û serkutker ya Îslamî a Îranê çeka Etomî bi karta manâ xwe dizane û wisa difikire ku ji

rêya bidevaneîna çeka Etomî dê bibe hêzeke mezin ya herêmî û welatên cihanê û heta parek ji welatên Ewropayê ji bixe bin gefa çeka Etomî û hevdem tevî vê yekê jî dikare bê tirs ji nerazîbûna civaka navnetewî, dengê civatên nerazî û azadixwaz jî hin dike bifetisîne.

Encam:

1. Heke Amerîka bi rawestandina demekî ya pirogramên Etomî yê Îranê razî be û rasterast tevî Îranê gotûbêjan pêk bîne, eva rejîm di vê taktîkê de (kirîna dem) serkevtî bûye û eva paşdeqîşaneke mezin di helwesta Amerîkayê de ye.

2. Gelo ev helwesta nû ya Waşingtonê û welatên berevankar ên Îranê di Konseya Ewlekariyê de bîne ser vê baweriyê ku dest ji piştgirîkirina Îranê ber bidin yan aliyê kê mî alî bin?

Lê di haletekê de ku tu yek ji van haletane ne qewimin, tê pêşdîtin kirin ku berengarbûn tevî siyaseta mezinxwaz ya Etomî a Îranê bikeve derveyî Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û Amerîka û hevalbendên wê dê naçar bibin bi xwe berengarî rejîma Îslamî ya Îranê bibin.

Gelo di vî haletî de ji di berjewendîya Rûsiya û Çînê de ye ku piştgiriyê ji Îranê bikin?

Pîroz Be 27'ê Cozerdanê, Salvegera Avakirina Dengê Kurdîstana Îranê

Siyamend Terbî

26 salan berî niha anku di roja 27'ê Cuzerdana sala 1359'ê Rojî (17.06.1980)'an de **Dengê Kurdîstana Îranê** bi peyama rêberê şehîd Dr. Qasimlo dest bi weşana xwe kir.

Dengê Kurdîstana Îranê di çaxekê de hate damezirandin ku Kurdîstana Îranê ji hemû aliyekê ve ketibû ber êrişa serbazên Îmamê Zeman û ji hêla kalê Cemarane ve Fitvaya Cihadê (xeza) bi dijî gelê Kurd hatibû derkirin û Pasdarên Îslama Naba Mihemedî bo bi destveanîna kilîta biheştê xwe ji tu cinayetêkê li Kurdîstanê de nedîparastin.

Dengê Kurdîstana Îranê di demekê de hate damezirandin ku sansoreke bê mînak di her aliyekê ve ketibû ser Kurdîstanê û çî nûçegihanekê serbixwe, azad û biyani nedikarî seredana

Kurdîstanê bike û rastiyan bide weşandin. Ev nûçe û raporên ku rejîmê jî derheq Kurdîstanê belav dikirin bi tevahî berevajî û dîr ji rastiye bûn.

Dengê Kurdîstanê di demekê da hate avakirin ku dorpêça aborî a xurt li ser Kurdîstanê hatibû danan û heta berahiya her cure derman û alavên nojdarî jî bo wê herêmê dihate girtin.

Di vê qonaxê de tenê Dengê Kurdîstanê bû ku tevî dengê çeka Pêşmerge bû û hawara mafxwazane û belengaziya gelê Kurd digehande guhê bir û raya giştî û cinayetên Rejîma kevnarpêrver a Komara Îslamî aşkira dikir.

Ev dengê rastin û zelal bû ku li ser soz û peymanê xwe li hember gelê Kurd da li jêr topbaran û mûşek û bombeyan de, bi ser û berî barnamên xwe diweşand û xincî du qonaxên diyarî kirî û bi ser da sepandî bo demekê jî ji xebatê



nesekiniye. Di pêşvebirina asta hişyariya siyasî, di warê çandî, hunerî, civakî, û hwd ... li gor îmkana şîyanê xebitiye û bûye dengê rastin yê gelê Kurd û zêdebarê vê zext û givaşa rejîmê û parazit (şêlû kirina) ku Rejîma Komara Îslamî di heyamê van 25 salan de existîye ser wê weşanê, dîsan jî di hundira hogir û guhdarên xwe de cih girtiye û bi evîneke zaf ve hogirê wî dengî bûne.

Dengê Kurdîstana Îranê, dengê hezaran dayikên cerg sotî, birayên pişt şikestî, bûkên dest bi hene, gernasên reş çalên rejîmê, dengê Pêşmerge û gişt gelê Kurd e.

26'emîn salvegera avabûna Dengê Kurdîstana Îranê ji gelê Kurd pîroz be.

Hevpeyvîna “More SEMO” Nûçegihanê Rojnameya ”Liberation”ê, Tevî Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê

Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ku ji bo Îraneke Federal û dût ji desthilata mesebî xebatê

dike, dibêje: “Demokrasi ji rêya leşkerî ve cihgir nabe”.

Her du sekreterên berî wî, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî jî di salên 1989 û 1992'an li Viyena û Berlînê bi destê torên sîxorî û ewlekariya Îranê hatin şehîd kirin. Birêz Mistefa Hicrî li derveyî Îranê de rêveberiya Partiya xwe dike. Ev Partiya (PDK Îranê) yek ji partiyên herî bi pêşîne û bi dirok û partiya herî bi pîrestîj ya Kurdî di Îranê de ye. Serbarê tepeserkirin û hevrikiyên di navbera Kurdan (ku 10 ji sedê ya nifûsa Îranê pêk tînin) û hêzên radikâl yê din weke Komelê de, PDK Îranê yek ji bingehên Opozîsyona demokratîk e.

Ev du hêzane (PDK Îranê û Komele) tevî partiyên Belûç, Azerî, Ereb û Turkman di kongireyekê (Kongireya Neteweyên Îrana Federal) de, ku kêmaniyan neteweyî yê wî welatî 65 jî sedê ya hemû nifûsa Îranê pêk tînin, beşdar in û ji bo Îraneke Federal û Demokratîk û bi dût ji desthilatdariya mesebî di xebatê de ne.

Çend mehek e ku şer û pevçûnên leşkerî û her wiha meş û xwenîşandanên aştxwazane dût ji tund û tûjiyê di hin cihên welat, li Bakûrê Rojava (Kurd û Azerî), li Başûrê Rojava (Ereb) û di Başûra Rohilâtê Îranê (Belûç) ber bi zêdebûnê ne û eva jî di halekê de ye ku hikûmeta Tehranê, Amerîkayê bi sebebê hilkirin û geşandina şer û dijberiyê di navbera neteweyên Îranê de tawanbar dike.

Birêz Mistefa Hicrî dibêje ku: Neteweyên Îranê êdî vê rewşê qebûl nakin û daxwazkarê bi fermî nasîna mafên demokratîk û wekhev yê xwe

ne.

Eva jî bi wateya bi fermî nasîna mafên demokratîk yê neteweyan û parvekirina mafê wekhev di navbera wan de, bi baldan bi wê ku çendin sedsal e em bi hev re dijîn, dê bibe sedema yekitiya axa welat.


Bi awayekê ku ger rewşa nihoyî dom bike, dê bibe sedema haydana bir û rayên cudaxwazane.

Xwast û aligiriya welatên derve ji bo guhertina rejimê jî ku piştî têkçûna reformxwazan bê hêvî bûne, roj li pey rojê di xurtbûnê de ye. Ji aliyê din bi baldan bi tela û bela bûn, bêhêvî û dilsariya li nav refên Opozîsyona demokratîk de, hevkarîya hêzên kêmaniyan neteweyî girîngiyeke taybetî heye.

Navhatî li doma axavtina xwe de da zanin ku: PDK Îranê li ser berxwednî û xebata aştxwazane a xelkê Kurdsitanê hesabê dike, bi taybetî dema ku bi çavên xwe destkevtên weke azadî û demokrasiyê dibînin û dizanin ku li gor van guhertinên ku di Kurdistana Îraqê de pêk hatine û xelkê Kurdistana jî Otonomiyek kemilî bi mîfah in, lewre di cehda bi rêxistina refên xwe ne.

Di rastî de rêberiya PDK Îranê ji sala 1992'an ve, bi derketin û nemana desthilata rejima Bees bi ser Kurdistana Îraqê de, di wê herêmê de cihgir bûye. Serbarê wê jî, PDK Îranê jî rêya radyo û televizyoneke esmanî ku li Rojavayê de hatiye damezrandin, programên xwe diweşîne.

Di çaxekê de ku alozî û rikeberanê di pêwendî tevî programên Etomî yê Îranê di rojevê de ye, birêz Hicrî diji her terze siyaseteke nerm li hemberî rejîma Îranê ye û tekezê dike ku ger Îran di encamê de li hember givaşên Ewropa, Rûsya û Çînê de bi awayekê paşve bikişê (paşdekişyanê bipejrine), dîsan jî dest ji programên Etomî yê xwe hilnagire. Ji ber ku ev



terze îmtiyaz dane ji aliyê hikûmeta Îranê ve tenê ji bo kirîna demê ye. Komara Îslamî ya Îranê jî bo parastina desthilata xwe bi her nirxekê jî be li hember gefên Amerîkayê û herweha serwerî û hejmoniya bi ser welatên misilman di hewla bidestveanîna çekên Etomî ye. Birêz Mistefa Hicrî di dawiya heftiya borî de, ji bo pişikdarîkirin di konferanseke de ku Enistîtûya Kurd li Parîsê lidarxistibû, hate Parîsê û dîsan li ser vê yekê tekez kir ku: Demokrasi ji rêya êrîşa leşkerî ve cihgir nabe. Ji ber ku guhertineke rastîn di Îranê de tenê ji rêya bizaveke dût ji tund û tûjiyê a Opozîsyona demokratîk û neteweyan misoger dibe. Lê van terze bizavane jî pêwîstî bi hevkarî û piştevaniya siyasî, bi taybet ji aliyê Ewropayîyan ve heye.

Têdîtin: Ev hevpeyvîne di hejmara 7814'an a roja 1nê, 23'ê Juena 2006'an di rojnameya “Liberation” ê ya Firansayê de hatiye weşandin.

Wergêr: Selîm Zencîrî

Şandeke Rêxistina “KÛRT-KAV” Ya Kurdistana Turkiyê Seredana Binkeya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Kir

Şandeke Rêxistina “Weqfa Çand û Lêkolînî ya Kurdî” (KURT-KAV) ya kurdistana Turkiyê ku pekhatibû ji birêz Celal Bayqîra, serokê rêxistinê û cigîrê serokê partiya “HAK- PAR” ê, birêz Letîf Epozdemir, sekreterê giştî, êareya roja sêşem, 30.03.1385(20.06.2006)'an, seredana binkeya Deftera Siyasî ya PDK Îranê kirin û ji aliyê şandeke partiye ve bi serokatiya birêz Hesên Şerefî, cigîrê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û bi hevrikiya birêz Elî Mêhrperwer, Mihemednezîf Qadîrî û Têmûr Mistefayî, endamên Deftera Siyasî û her wiha birêz Rostem Cehangîrî, endamê Komîteya Navendî û birêz Azad Kurdî ji Rojnameya Ağirî, pêşwazî ji wan hate kirin.

Di vê hevdişînê de rewşa jiyana siyasî, aborî, civakî û çandî û wd... ya gelê kurd li kurdistana Turkiyê û her wiha bir û rayên şanda “Weqfa Çand û Lêkolînî a Kurdî” kete berbas. Helwesta partiyên siyasî yê kurdistana Turkiyê aliyê sereke ya gotûbêjên

hevdişînê bû ku her du aliyên bi hûrî ditin û nêrinên xwe jî hev du re şrove kirin. Her wiha şanda PDK Îranê, helwest, raman û siyasetên xwe derheq pîrsa çaresernekirî ya Kurd li Turkiyê û hin pîrsên din yê jiyana Kurdan li Bakûrê Kurdistana anî berbas.

Hêjayî gotinê ye ku “Weqfa Çand û Lêkolînî ya Kurdî” yekemîn rêxistina Kurdî ye ku ji aliyê dadgehên Komara Turkiyê ve hatiye pejirandin û navenda wê jî li bajarê Stenbolê de ye.

Birêz Rostem Cehangîrî:” Rasîzm Nagihîje Astekê Ku Rêberiya Her Du Gelên Kurd û Azerî Bi Dest Ve Bigire”

Hevpeyvîn: Xalid Mihemedzade
Werger: Selîm Zencîrî

Pirsa erdî û hevsînûr bûna Kurdistanê tevî cîranên xwe ji aliyekê dikare wekî doz û pirsgirêkek li pêşerojê de

bihê dîtin û ji aliyê din jî dikare bibe bi mînakê ji bo bi hev re jiyana Kurdan bi neteweyên cîran re. Lê ya ku girîng e eva ye ku van pirsane pêwîstî bi hebûna rêberiyêke zana û berpirsiyar di navbera Kurd û neteweyên din de heye, bona vê çendê ku hemû aliyekê ber bi bihev re jiyanêke aşîxwazane û çareserkirina van pirsane ji rêya demokratîk de bibe.

Mijara rûniştina vê carê ya me axavtinek li ser van deverane ye ku di navbera Kurd û Azerîyan de li ser Kurdistanibûn yan Azerîbûna van bas û gengeşe heye û ji bo vê pirsê me birêz Rostem Cehangîrî, him weke endamê Komîteya Navendî a PDK Îranê û him jî weke kesekî şareza û ji dayîkbûyê Bakûrê Kurdistanê Rojhilat anî ziman ku ev hevpeyvîne lê derket:

Birêz Rostem Cehangîrî di destpêka axavtina xwe de vê rastiyê naveşere ku neteweya Kurd ne tenê derheq doza axa xwe tevî desthilatê, belkî bi van neteweyan re jî pirsgirêk heye ku weke cîran bi salan e bi hev re dijîn.

Di vê derheqê de dibêje: “Bi raya min me ne tenê pirsaxê digel neteweyên cîran de heye, belkî bi desthilatê re jî heye. Pirsgirêka me bi Azerîyan re yek ji wan e. Navê Azerbaycana Rojava bi ser Kurdistanê sepandine. Ger Azerî hinekê nermew bin û aqilane jî pirsan binihêrin dizanin ku piraniya Azerbaycana Rojava, him di warê xak û him jî di warê rûniştîyan de Kurd e. Bêguman heke hîlbijartinek rast û adilane bihê kirin, ev rastiyê baştir dê ji me re derbîkeve. Diyare em jî hemû hîlbijartinên ku him li serdemê desthilatdariya Şah de û him jî niha hatine kirin, nerazî ne. Çunkî xelkê nekarîne azadane deng bidin ku vir Kurdistan e yan Azerbaycan? Lê pirsyar eva ye ku me pirsaxê erdê di gel Azerbaycanê de heye yan na? Di rastî de me ev pirsaxê heye. Desthilatê jî çi karek jî bo kûr û berfirehkirina van dijberî û hevrikiyane kiriye, cihê behsa me nine.

Yanî eva ku niha parek zaf ji Kurdan tê de akincî ne û bi Azerbaycana Rojava hatiye bi nav kirin, hûn bi Azerbaycan nizanin?

“Ez dijî navê Azerbaycanê me ku li ser Kurdistnê hatiye danîn. Lê çima navê vê Parêzgehê kirine Azerbaycan? Ev siyasetek e ku him li serdemê desthilatdariya Mihemedreza Şah û him jî niha berhema sovînzîma Fars e ku her



Rostem Cehangîrî

tim dixwaze dijberiyê di navbera van du neteweyan de pêk bîne.

Ez bawer im ku navê Azerbaycana Rojava, navek ne jêhatî û ne rewya ye. Ji bo ku ne mafê Kurdan û ne jî mafê Azerîyan bihê şewitandin, ez pêşniyar dikim navek taybet ji boy bihê danîn ku ew jî dikare **parêzgeha Urmîyê** be. Ji bo van arîşeyên ku derdikevin rojevê, em dikarin ji rêya diyalog û belge û giroveyên dirokî çareser bikin, çunkî tu pirsaxêkek bi şer, şîdet û tundrewiyê ve çareser nabe.”

Her wekî di axavtînen te diyar e tu li dijî navê Azerbaycana Rojava li ser wan deverane de yî. Pirsyar eva ye ku we çi fakt û giroveyek heye ku Kurdistnî bûna wan deverane bide eyanê?

“Fakt zaf in. Bo mînak Kurdên Xorasanê li kuderê re çûne wir? Ku niha jî bi Kurmançî dipeyivin. Niha jî belge û girove hene ku ew jî devera Celalîyan, jî çiyayê Agirî ve bo berevani jî sinorê Îranê bo Xorasanê hatine veguhastin, lê merema bîngêhî ya wan siyaseta dijî Kurd û armanca kêmtirkirina nifûsa Kurdan li van herêmanê de bûye. Şoreşa Xanê Lep Zêrîn, Dim Dim, Şoreşa Simkoyê Şîkak, Şoreşa Agirî û Şoreşa Qazî Mihemed, nişan û berjenga wê yekê ne ku Kurdên van deverane ne mêvan in, belkî xwediyê xaka xwe ne. Her weha di Kurdistanî bûna van deverane de jî min tu şik û guman nine, lê ez kesê jî di van herêmanê de bi mêvan nizanîm û Azerîyan jî bi mêvan nizanîm.

Başê bi raya te ew dijî Kurdbûna ku hûn qala wê dikin tenê ji aliyê hikûmetê ve meşiya ye yan xelkê Azerbaycanê jî tê de pişikdar in?

“Em dibêjin ku hikûmeta Îranê ev karane kirine, ewa ku kiriye jî, di vîc û berjewendîya Azerîyan de nebûye, çunku zulm û zor ji Azerîyan jî hatiye kirin û Azerî jî weke Kurdan bindest in”

Eva ku hûn xelkê wê deverê ne, başê we çi serpêhatiyêke xweş yan tal di bi hev re jiyana bi Azerîyan re heye?

“Ger tu vîc pirsaxê jî Azerîyekê jî biki, renga bibêje ku ger me dijayetiyeke jî hebe, eva karê dujminê me ye. Çunku Kurdan û Azerîyan hertim dijî desthilatê xebat kirine. Rast e ku Azerî di warê aborî, meseb û heta beşdarbûna di destlîhat û dezgehên hikûmetî de herdem destçûyî bûne, lê ew jî wekî neteweya Kurd bindest in. Diyare dema ku şerê Kurdan tevî hikûmetê dest pê dîke, guleya yekemîn Kurd û Azerî ber bi hev nişan dikin. Ger em dîr neçin, piştî şoreşa 1357(1979)‘an, ku xebata gelê Kurd bi rêberiya PDK Îranê û pariyên din dest pê kir, heke em mêzeyî zirar û xisarên dujmin, bi taybet di herêmanê Bakûrê Kurdistanê de bikin, yek ji sê ya wan Serbaz û Pasdaran ku dihatin kuştin, Azerî bûne.

Mixabin Kurdan nekariye ji Azerîyan re bidin selimandin ku şer û xebata me tevî

we nine, belki tevî hikûmetê ye. Di vê derheqê de Azerî jî gunehbar in û renge guh bi gotinên Kurdan nedabin ku birayê min ye Azerî, tu jî wekî me bindestî û heqê te ye ku daxwaza mafên xwe bikî"

Başe lêxistina nişanê Kurdistanibûnê ji wan dever û herêman nabe sedema aloziyê, çunku renge ev nişan cihê pesenda Azeriyan jî nebe?

"Eva ku Azerî dibêjin Azerbaycan e, Kurdan pê nexweş e. Kurd jî gava dibêjin vîra Kurdistan e, jî Azeriyan re giran tê. Lê me li bernamê û programa PDK Îranê de bi zelalî nivîsandîye ku Kurdistan ji çar parêzgehên: Îlam, Kirmaşan, Kurdistan û Azerbaycana Rojava pêk hatiye. Me him weke PDK Îranê û him jî weke xelkê vê deverê ku bi sedan sal e bi hev re dijîn, ev hesasiyeta ku niha hin kes û aliyên Kurd û Azerî dixwazin pêk binin, me nine. Ev karê wan çî zanayane û pisporane be yan jî nebe, bi véc û qazanca dujmin xilas dibe û jî me re çî pêre çê nabe".

Wekî cenabê te qala wê kir niha him li nava Azeriyan û him jî di nava Kurdan de, du aliyên tund û dijî hev li ser Kurdistanibûn yan Azeribûna wan deverane li hemberî hev de rawestane. We jêve nine ku ev du alî û hêlene pevra jiyana ku te qala wê kir aloz û tək dide?

"Min jêve nine ku Rasîzizm, wateya netewexwaziya tund û hişk him di nava Azerî û him di nava Kurdan de bigihîje astekê ku rêberiya van du neteweyane bi dest bigire û van du neteweyane berengarê hev bike û rastî şerê navxweyî bikin. Weke ew karê ku tundrewên nava hikûmetê sala 1358(1980)'ê di Nexedê de kirin.

Diyare ew bûyer û alozî desthilatê afirand û hikûmetê merema xwe ya taybetî jî hebû û dixwest bi hilkirin û geşandina şerê Kurd û Azeriyan him şoreşa Kurdan pê bihilosîne û him jî desthilata xwe cihgir û qahim bike. Lê niha hizr û ramana Kurd û Azeriyan gelek zîrektir ji baskên tundrew ên hikûmetî ye, û dikarin rêyên aqilane jî bo bi hev re jiyane peyda bikin".

Her wek hûn haydar in, nameya Nezmî Efsar kêşê û hawareke mezin di nava Kurdan de çekir. We jê ve ye ku ev haware li cihê xwe de bû? Nêrîna te li ser nameyê çiyê?

"Min gelek hesasiyet bi nameya Nezmî Efsar nişan neda. Çunku Navhatî jî dikaribe wekî ew kesane bihê hesibandin ku xwe di refa tundrewên Azerî de dibinin.

Ger wiha jî nebe, dixwaze bi hin liv û helwestan ku navê wî li tu cihê de nine, bi van tiştane xwe bide nasandin. Her wiha jî bîr nekin ku ew malpera ku hevpeyvîna Nezmî Efsar tê de hatiye weşandin, li ser xerc û pereyê hikûmetê

birêve diçe. Weşandina nameya navhatî jî bi merema afirandina dubendî û dijayeti li navbera Kurd û Azeriyan de bû û herwiha dixwaze xwe bide nasandin ku belê ez berevankar û parêzerê mafê Azeriyan im. Di nameya wî de heya qasekê jî bêedebî hebû û bêhurmetî û sivikatî bi rêberên Kurd dike. Lê ez vê yekê bi bêhurmetî nizanîm, çunku mezinên Kurdan li mêj dem e gotine ku: "Heke tu bixwazî kurê Kurdan nas bikî, mêzeyî zimanê dujminên Kurdan bike". Dema ku dujmin bi başî qala rêberek te kir, bizane ku wî rêberî xizmeteke baş bi neteweya xwe nekiriye. Ez tu car çavniheriyê jî Nezmî Efsar û kesên weke wî nakim ku bi başî qala **Simko** bikin. Her wekî wê ku daxwaz ji min bihê kirin ku were pesna **Ata Turk** bike! Nezmî Efsar muhreyê hikûmetê ye û giring jî nine ku li kur dijî. Renge dijber û Opozisyon jî be. Di nava Opozisyonê de jî şovînizm heye. Ez dê vegerime ser gotineke te li civîna vê dawiyê ya ku te got: Nefsa Opozisyon bûnê bi tevahî nahê wateya şoreşger û demokratbûnê. Lewre ez jî dibêjim ku hemû Opozisyonê nikare qala biratî û ... bike".

Tu çawa mêzeyî bersiva birêz Mistefa Hicrî bo navhatî dikî?

Diyare rêzdar Mistefa ew nameye wekî şexsê xwe(taybetî) nivîsandîye, ne wekî Sekreterê Giştî ye PDK Îranê. Lê ez vê nameyê bi nameyek siyasi û berpirsaryane dizanim. Name bi hest bi berpirsaryariyê ve hatiye nivîsandin. Ceht û tekoşin jî ji bo wê bû ku ew gotin û axavtina ku li navbera du neteweyan de derketibûne holê û renge destê dujmin jî tê de hebe, diviya bizav û kiryarek wiha bihatiba kirin ku vê toz û domanê binivîne û bi qazanca dujminên her du neteweyan xilas nebe. Lewma bi raya min kekê Mistefa Hicrî gelek berpirsaryane tevî vê meseleyê liviya. Yên ku rexneyan jî digirin ku çima gotiye Azerbaycan, merema wî navê Azerbaycanê ye ku bi fermî heye, him niha û him jî li serdemê Hikûmeta Şah de. Lewma nabe ku miroveke berpirsaryar li asta herî bilindî ya partiye de rabe bibêje ku lêxin, bigirin û bikujin...".

Te di gelek gotinên xwe de qala wê kir ku hikûmet li pişt van pirs û kêşane de heye. Lê pirsyar eva ye ku heta li nerazîbûn û xwenişandanan herî dawîn yê Azerbaycanê de jî derket ku Azerî yeketiya Azerbaycanê dixwazin. Te jêve nine ku ev yeketiye dikare di pêşeroja Kurdistanê de asteng û pirsgirêkan biafirîne? Bi vê wateyê ku ger li gor daxwaza wan be, parek zaf jî Kurdistanê li ser Azerbaycanê bihê hesabandin?

" Ez serxwebûn û serbixwexwaziye jî bo hemû neteweyekê bi rewşa berheq dizanim. Dema ku ez dibêjim Kurdan mafê serxwebûnê hene, min hinek îdeayên erzî (erdî) jî hene ku renge bigihîje aliyê Zencan û zaf cihên dinê.

Lê min qala wê kir ku Rasîzma neteweyî di astekê de nine ku bikare rêberiya van neteweyane bi dest ve bigire û bikarin li ser bihostek axê şer xweş bikin".

Yek ji wan mekanîzmên ku niha di cihanê de ji bo yekalî kirina doz û pirsgirêkan tê pêşniyar kirin û kar jî pê tê kirin, Referandom yan hilbijartin û vegeeriyên ji bo dengê xelkê ye. Başe te jêve nine ku heke rewş û etmoferek wiha ji bo referandomê pêk bihê û dengdan bo ser sindoqên dengdanê bibe bi xwestek giştî û hemû alî, Kurdistanibûna wan deveran ku pirsgirêka xwedîtiyê li ser heye, deng bîne?

Netenê referandom, belkî belge û giroveyên dirokî jî hewce ne. Rêya dawîn referandom e. Dema ku em dibêjin Refrandom, divêt li asta Parêzgehê de bihê kirin û her wiha divêt jî bo xelkê resen yê van deverane bihê kirin. Her çend ez hêvixwazim ku ev meseleye negihîje referandomê, diyare ger referandom jî bibe, Kurd dê ser bikevin".

Hûn rola partiyên Kurdî di van doz û pirsgirêkane de çawa dibînin?. Pirs caran rexne ji partiyên têt girtin ku di selimandina Kurdsitanî bûna van deverane de bê şîyan û karîna bûne, yan dibêjin di vê derheqê de tu karek nekirine?

"Bi raya min ev nasîyonalîzma tundrewane ku çê bûye, çî nekirî ye. Ger xebata bi dehan û sedan salî ya rêberên Kurd neba, Kurd niha her nemabûn. Niha bi hezaran Kurd di Kurdistan Îranê de bi navê Simko tên navkirin û cihwarên wan jî bi cihên dirokî tene mêze kirin. Bi giştî jî aqil û mentiqê bi dūr e ku aliyê tundrew dibêje partî û şoreşên Kurdan çî nekirine, lê renge kêmkarî hatibe kirin.

Başe tu Simko Çawan dibîni?

"Ez ne herêmçiti(nawçe gera) difikirim. Lê ez jî dayîkbûna nasîyonalîzma Kurdî di Simko de dibînim. Ez Simko bi çavkaniya nasîyonalîzma Kurdî dizanim."

We jêve ye ku partiyên Kurdî domkerê wê nasîyonalîzma Simko bin ku tu qala wê dikî?

"Belê min jêve ye ku PDK Îranê piştî Simko, yekemîn partî ye ku rola eslî û bingehîn a şoreşa azadixwazî ya Kurdan di Îranê de bi dest girtiye. Lewre ye ku dujminên Kurd ewqas ku êrişê dikin ser vê partiyê, li çî partiyek din nekirine. Fakt û girove jî bo gotinên min eva ye ku PDK Îranê di qada xebatê de maye û serê xwe netewandiye, radestî dujminên xwe nebûye. Lewma hesasiyet bi vê partiyê jî aliyê dijmanan ve gelek zaftir e. Mêzeyî diroka pir jî serbilindî û şanazî ya vê partiyê bike.

Demokrasî, Biha û Piratîka Wê

Beşa 28

Kurmanç Hakkî

kurmanchakki@yahoo.com

Saziyên ku alîkariya diyaloga giştî dikin

Gelo çawa demokrasiya delîberatîv dê çî bi çî bibe? Ji ber ku demokrasiya dixwaze ku

biryarder û ekterên siyasî sozdar û girêdayî bi bingehên demokratîk bin, demokrasiya tenê nikaribe li rêya saziyê weke Parlemanê bihê çî bi çî kirin. Di civakê de hewce bi sazî û navendên din jî heye, ji bo ber bipêşbirina hêza berhevdana giştî.

"Elster" (1998) jî bo zêdekirina diyaloga giştî, jî bo darîştina destûra bingehîn, şeweyên jêrîn pêşniyar dike: (i) Endamên desteya civîna darîştina destûra bingehîn bi dengê welatîyan bihê hilbijartin jî bo ku nûneriya aliyên berfireh yê civakê di nivîsina destûrê de beşdar be. (ii) Elitên serbazî, siyasî û dewletî jî ber wê ku xwediyê berjewendiyên taybet in diviya li darîştina destûrê dîr bihên kirin. (iii) Beşek jî destûrê bi awayê vekirî û eşkere bihê darîştin û beşek jî bi awayê nihênî. Eşkere darîştin û beşdariya giştî dibe hegera wê yekê ku aliyê dadperweriyê bihê berçav girtin. (iv) Pesendkirina destûrê bi merca referandum û dengê welatîyan be, ji bo ku yasa bibe cihê pesend kirina giştî.

Hilbijartina endamên civaka ku destûra welat dadirêje û herwisa jî holê der xistina wan kesên ku destûr rasterast kar dike ser jiyana wana (xalên i û ii), dikaribe alîkariya pêşveçûna yeksaniyê û toleransê bike. Hevdan û întegrekirina vekirî û karê bi nihênî û wacibkirina dengdana bi destûrê (xalên iii û iv) dibe hegera wê yekê ku biryarder hegerên hilbijartina siyasî û ramanên xwe yê pêwendîdar bi destûrê jî bo welatîyan bi awayekî berfireh şirove bikin û welatîyan rêya beşdarî li dibata pêwendîdar bi destûrê hebe û eger bi dilê wana nebû, pêşniyara destûrê qebûl nekin. Pêşniyara "Elster" jî bo destûrê û şewaza organîzekirina wê dikaribe bo pirsên din yê demokrasiyê jî bi kar bihê.

Gelo rola welatîyan di demokrasiya li ser bingeha nûnerayetiye de çîye? Rola welatîyan di demokrasiya delîberatîv da, jî aliyekê beşdarîkirin li şirove û nirxandina biryaran piştî wana ye û jî aliyê din jî beşdariya çalakane li rojevên siyasî yê berî biryardanê. Vekirîtiya û Parlemantarizm mercên wê yekê ne ku welatî dikaribin bi awayekî berfireh beşdariye di çalakîyên siyasî de


bikin. Rola welatîyan di demorasiya delîberatîv de bi du (2) awayan tê ditin. Beşdariya wan di çalakî û diyaloga siyasî ya berî hilbijartinan de û her wisa beşdariya wan di dibatên paş biryardanê giştî de tê ditin. Merca demokrasiya li ser bingeha nûnerayetiye, eşkereyî û vekirîtiya pêvajoyên ber bas li dema biryardanê û îmkana beşdariya welatîyan li diyalogên pêwendîdar bi pirsên ku tîr biryardanê ye.

Pirsyara herî zehmet eva ye ku gelo çawa di demokrasiyê de dê beşdariya çeleng ya xelkê li ser û bendên hilbijartinan yan biryardan zêde bibe? Di civaka modern da şansê welatîyan li rêzkirina basên cihê biryarê gelek sinûrdar e. Pîspor, birokrat, partî û karbidestên dewletî û medya di rastî de pirsên ku diviya bîr ber basê, jî bo ku biryardanê diyarî dikin û ditin û hizrên welatîyan pîranî li ser wan pîrsa ne yêr ku bi hazirî digehin ber destê wan.

Li gor "Barber" (1984) di demokrasiyê de diviya meydana beşdariya welatîyan bi armanca zêdekirina hêza şirove û têgehiştina wan li berjewendiyên giştî berfirehtir bihê kirin. Li gor wî di damezrandin û diyarîkirina saziyên biryarder de, diviya giraniyek zêde bi biryarên bi şirove û li ser bingeha têgehiştina berfireh bihê dan. Li gor wî jî bo zêdekirina hêza şirove û ramanên welatîyan di pirsên siyasî de sazîkirina dengdanê giştî (referandum) yêr wan pêwîst in ku xalên ku diviya biryar li ser wan bihê dan, zêdeyî du alternatîvan bin. Ji bilî wê yekê "Barber" pêşniyar dike ku jî bo pesendkirina yasayan dudu gerên dengdanê hebin hetanî her carê welatî bîkaribin bi awayekî berfirehtir di pesendkirina yasayan de beşdar bin. Du gerbûna dengdanan xwe bi xwe nabe hegera wê yekê ku hêza hizr û analîza welatîyan zêde bibe û welatî bi awayekî aktîvtir beşdarî dibatên siyasî bin.

Beşdariya çalakane û pêşvebirina têgehiştina giştî li astengên herî mezin yêr demokrasiya delîberatîv in. Siyasetzanên hin navend û sazî jî bo pêşvebirina hizra beşdariya çalakane û bilîndkirina asta têgehiştina giştî peyda kirine. Yek jî van hizra "Dahl" ya "minipopulus" wate netewa biçûk e ku di beşên berê de bi kurtî li ser vê mijarê hatiya bas kirin.

Li gor "Dahl" "minipopulus" dikaribe di her astekekê de: astê gund, bajar, û seranserî û navnetewî de jî bî sazîkirin. Li gor wî bo nimûne jî bo pêkhatina "minipolulus"ekê dikaribe hezar (1000) welatî bi awayê şansî bîr diyarî kirin. Minipolulus di midehê salekê de li ser pîrsîrêkek taybetî civînan saz bike, ser de biaxive û derbarê wê de bibe xwediyê hizra xwe. Ji bo pêşveçûna



minipopulus, bikaranîna teknolojiya nû weke kompyuter, înternet û dezgehên din ên ragihandinê dikaribe bihên bikar anîn. Di rewşa gelê Kurd de û di nebûna îmkana civaka sîvil û azad de bûna "minipolulusan" li rastî de dibe hegera wê yekê li ser pîrsîrêkên bayedar û giring yêr netewî welatîyên derve û hundirê Kurdistanê bi awayekî berfireh beşdarî li pêvajoyên siyasî û bikaranîna wan li pêşveçûna doza netewî de bikin. Li gor "Dahl" yek jî karên minipopulusê bo nimûne diyarîkirina ew pîrsîrêk û pêvajoya ne ku minipopulusên din diviya li ser wan biaxivin û bigehin encamê.

Ji bo beşdariya hizr û ramanên minipopulusan di biryardanê de, "Dahl" pêşniyar dike ew pêşniyarên minipopulusan bi awayekî micid wek ideala demokrasiyê li beşdariya çalakane ya welatîyan bihê wergirtin û qîmet bi wan pêşniyaran bihê dan ku jî bo biryardanê pêşkeşî biryarderan tîr kirin. Bi vî awayî pêşniyarên minipopulusan yasayî tîr hesab kirin.

"James S. Fishkin" (1991) jî bo pêşveçûna demokrasiya delîberatîv şewaza nirxandina hizra welatîyan pêşniyar kiriye. Li gor wî jî bo pêşveçûna demokrasiyê û bilîndbûna asta beşdarî û hizra giştî hewce ye aliyên siyasî yan welatî li ser pîrsîrêkan bi awayekî vekirî li hemberî hev rûnên. Her çend bi hizra "Fishkin" jî bo pêşveçûna asta têgehiştina giştî pêwîst bi bikaranîna teknolojiya nû nake, lê ew jî mîna "Dahl" li ser vî baweriyê ye ku divê beşdarên dibata gotûbêja rû bi rû û bi awayekî şansî bihên hilbijartin. Bi vî awayî şansê wê yekê ku welatî û ditînen cur bi cur yêr wan bi awayekî wekhev beşdarî diyaloga pêwendîdar bi pêşveçûna demokrasiyê bikin, wek hev e.

Bi bawerîya "Fishkin" beriya beşdarî di diyaloga rû bi rû de, welatî bi awayê nepenî dê bersiva pîrsyarên pêwendîdar li rêya rapîrsiya delîberatîv¹ dê bidin. Bi raya wî lêkolîn nişan didin ku hizra beşdarên di rapîrsiyê de li gor dem û her wisa zafbûn yan kêmbûna zanyariyê

tê guhartin. Lewma bi berhevdana ditina welatiyan berî basê û her wisa piştî diyaloga pêwendidar, mirov dikaribe asta kardanewa diyalogê li ser welatiyan bibine.

Merca beşdariya rapirsîya delîberatîvê du xal in: 1) beşdarên berhevdanê nûneriya hemû çin û beşên civakê di xwe de bigirin û 2) di diyalog û basên pêwendidar da merca beşdariya nûnerên dîtin û ramanên hemû welatiyan û civakê bi awayekî wekhev û bi parastina otonomiya takekes li derbirîna hizr û ramanên xwe bihê parastin. Berhevdana delîberatîv ya ramanan di rastî da wek ceribandinekê ye ji bo ditina wê yekê ku çawa têgihîştin û ramanên giştî yên civakî pêk tên.

Di welatên demokratîk da ji bo pirsgrêkên cur bi cur gelek çaran rapirsîya giştî hatiye saz dan. Bo nimûne qalkirin bi hindekan dikaribe alikariya vê basê bike: Rapirsîya giştî li ser piştgirî û alikariya Amerîka bo welatên feqir di sala 1996'an. Li welatê Çek, sala 1996'an rapirsî ji xelkê hate kirin ji bo helbijartina alternatîvên cur bi cur yên vejenê (enerjî). Li Bîrîtaniya di salên derbazbûyî de rapirsîna delîberatîv li ser pirsgrêkên pêwendidar bi tawanbarî¹, hevgrîtina Ewropa, pêşeroja sistema Paşahiye li wî welatî hatiye encam dan. Her wisa li Australiyayê sala 1999'an, rapirsînek delîberatîv pêk hat ji bo biryardan li ser serxwebûna tewaw û damezrandina Komara Australiya yan jî man wek beşek li Padîşahiya Bîrîtaniyaya mezin. Di sala 2000'an de ji li welatê Danîmarkê rapirsîya delîberatîv li ser endametiya Danîmarkê li diravê hevbeş yê Ewropa wate "Euro" de. Di wê rapirsînê de 364 welatiyan beşdarî kiribû.

Rapirsîya delîberatîv her wisa li rêya ragihandinan û radyo û televîzyonan hatiye zêrevanî kirin. Weşana encama rapirsîya delîberatîv li radyo û televîzyonan de dibe hegerê vekirîti û eşkerebêjîya civakî û bi vî awayî welatî dê ji rêya ragihandinan de agahdarê encama rapirsîyê bibin. Hetanî wê gavê rola rapirsîyê piranî wek berhevdana raya giştî û pêşdîtina hegera şewaza dengdana xelkê li helbijartinan hatiye dîtin. Bi vî awayî rapirsîya delîberatîv wek piştevan û alîkareke demokrasiya li ser bîngeha helbijartin û nûnerayetiye hatiye dîtin.

Armanca destpêkî ya beşdariya delîberatîv li pirsgrêkên pêwendidar bi demokrasiyê û çarenivîsa welatiyan bûn bi cihê hitbar û bawerîbûna sistema rêberiya civakê ye. Ji bo ku demokrasiya bikaribe bi awayekî piraktîk bikeve nava welatiyan, hewce bi gelek sazî û enîstîtuyên demokratîk weke civak û encûmenên herêmî, saziyên medenî û hwd heye. Armanca sistemên demokratîk diviya wekheviya siyasî û civakî ya welatiyan be û ji berçavgirtina hewcehiya siyasî, civakî û aborî ya welatiyan be.

Di beşên tê de em dê encama dawî ya gotara xwe û kurtiya basên hatî kirî, şîrove bikin.

Kirîn û Firotna Keçên Îranî li Keraçiya Pakistanê

Li gor nûçevaniya Îlîna, rojane 45 keçên Îranî li bazara Keraçiyê tînin kirin û firotin ku cihê şikê nîne ku ev keçane ji bo mifah wergirtina nebaş ya zayendî di rêya bandên desthilata rejîma Komara Îslamî tînin kirin û firotin.

Hêjayî gotinê ye ku hejmara keçên hilatî di Îranê digihîje 300 hezar kesan û nêzik bi



86 ji sedê ya keçên ku cara yekem ji malê direvin, rastî tecawîza zayendî dibin. Herwiha hejmara ciwanên tûsbûyî bi pirsgrêkên rûhî û meraqê li Îranê, digihîje 8 heta 10 milyon kesan ku piraniya wan keç in.

Jêder: Malpera "roshangari"



Girtin û Azara Cendekî Ya Zarokek Kurd

Zarokek Kurd bi navê **Rehîm Salihî** xelkê bajarê Seqizê bi guneha belavkirina teraktên partiyekî Kurdî ji aliyê hêzên Sipaha Pasdaran ya gundê Mîrdê hate girtin û di Navenda Leşkerî de tevî lêdan û eşandinan cendekî berengar bû.

Çavkanî: RMMK.org

Xwekuştina Serbazakî Kurd

Serbazekî Kurd bi navê **Hadî Weysî** xelkê bajarê Seqizê ku ji bo zîndana Kamyaranê bi neçarî hatibû dîrxistin, bi lîxistina guleyekê bi serê xwe dawî bi jiyana xwe anî.

Navhatî bi sedema dubendî tevî berppirsê xwe du roj berî xwekuştinê, ji bo zîndana Kamyaranê hatibû dîrxistin.

Tê gotin ku ev serbaze tûşî meraqa ruhî bûbû.

Çavkanî: RMMK.org

Rejîm Dîsan Li Bajarên Kurd û Azerî Akincî De Arîşe Diafirîne

Li gor agehiyên gihiştî bi "Kurdistanmedia" ê çend rojan berî niha li nava bajarên Kurd û Azerî akincî de, daxuyaniyek hatibû belavkirin ku tê de gefa şewitandina van dikanan hatibû kirin ku xwediyê wan kurd in û li ser derê dikanên xwe bi Kurdî nivîsandine. Her wiha di daxuyaniya han de hatiye ku heke di demeke kurt de nivîsên kurdî yên ser dikanên han nehên rakirin û bi zîmanê Farsî yan jî Azerî nehên nivîsandin, ev dikan dê bihên şewitandin.

Bê guman eva jî pîlaneke nû ya kirêgirtiyên rejîma Komara Îslamî ye ji bo afirandina

dubendî û arîşe di navbera Kurd û Azerîyan de.

Em tevî mehkûmkirina kiryara han û her cure kiryarekê ku arîşe li bajarên Kurd û Azerî akincî de pêk tîne, ji xelkê bajarên han daxwaz dikin ku bi tu awayekê guhdarî tu pîlanên şeytanî yên rejîmê ne bin û li pey ne çin.

Li Bajarê Sewlava Keçekê Agir Berda Xwe

Roja 10.06.2006'an, li gundê "Hevmine" ya ser bi bajarê Sewlava, keçeke 22 salî bi navê "**Kwêstan**"ê agir berda xwe û jiyana xwe ji dest da. Hetanî niha sedema vê xwekuştinê ron neûye.

Serdemê Dayîk Serdestiyê

Amadekar: Hemîd Muxtarî

JXweza û rewşa coxrafî ji
sebebên bingehîn yê
pêkhatina çand, terzê jiyane û

çawanîya berhemanîna madî û
menewî ya civaka mirovî bûye. Ev
yeka li dewranên berê de, dewranek
ku senet û pêşkevîna diyar nebû,
berçavtir bû, xweza û coxrafî, sinûr û
raber, nizmî û bilindî, av û hewa,
taybetmendiyên deverên coxrafî û wd
... her yek ji wan bi awayekê bandora
xwe li ser kemilandîna jiyana civakî û
çandî ya xelkê daniye.

Peydabûna mirovan li ser erdê tevî
pêkhatina malbatê hevçax bûye û
bêşik berevanî kirin ji jiyana mirovan
li hember heywanên hov û bûyerên
siruştî, bûye sebebê pêkanîna jiyana
bi tebahî ji bo mirovan. Her ji
destpêka bi hev re jiyane de, pêrewî
kirin ji yasa û qanûnê weke erkekek ji
bo hemûyan hate diyarî kirin, ku hêdî
hêdî aliyê exlaqî bi xwe ve girt. Ev
serûberîya him di jiyana malbatî de û
him jî di jiyana eşîretî de ku yekemîn
xelkê piştî malbatê ne, ser girt û her
çend sistemên civakî pêşketin û bûne
sebebê pêkhatina hikûmet û
împeratorîyan, lê çî demekê malbat
weke bingeha mezin ya civakê ji nav
neçû?

Di vê demê de dayîkê di malbatê de
roleke girîng hebû û çimku
berpirsyariya xizmetkirina bi
endamên malbatê û elimandîna
zarokan li stûyê wê bû, tu dibêjî ku
serûberîya malbatê û hebûna wê li ser
afirandin û heza dayîkê hatibû
avakirin û bab roleke wisa tu nebû. Bi
gotina "Wil Durant" seba wan şîyanên
dayîkê (jin), erkê bab (mêr) di astekê
herî nizim û kê de bû.

Kar û xebata jinê li ser erdê,
têkiliyeke qahîm û xurt di navbera wê
û axê de pêk dani û her eva bû
sebebê vê çendê ku jin di cotkariyê

de pisporî û şarezayiyê bi dest ve bine
û hinek tiştan biafirîne. Yanî li ciyê
komkirina hibûbatan, bi xwe dest bi
veşandîna tow û çandinê dikir, û
mêran jî di vê demê de cehd dikirin
da ku alav û amûrên cotkariyê



(dasikên ku bi keviran dihatin çêkirin,
meryên xwar û wd ...) çê bikin û
erdê ji bo mifah wergirtina pitir amade
bikin. Divêt were gotin ku yek ji
sebebên tikelibûna jinan bi malbatê û
kar û barên cotkariyê, rewşa
berevaniya civakê bû. Bi vî awayî ku
erkê berevanî û şer kirinê, mêran li
stû girtibû û piraniya deman mijûlê
şerên cur bi cur tevî dijmin û neyarên
desteya xwe bûn û derfeta hewce ji bo
karkirinê di nava malê û zeviyê bi
destve nedanîn. Jin ku sebebê
afirandîna sistema cotkariyê bû, hêdî
hêdî karîna heywanan jî kedî bikin û ji
xêncî mifah wergirtina xwarinê ji wan
weke hêza karî jî mifah wergirin û ev
yeka guherîneke mezin di jiyane de tê
hesibandin. "Wil Durant" bi sererastî
dibêje ku di civakên destpêkî yê
mîrovahiyê de piraniya pêşketinên
aborî bi destê jinan ve hatiye kirin ne
bi destê mêran ve. Ev dibêje her ev
jina destpêkî yekem weris û piştê
perçe afirand û her wiha eva jin bû ku
bo sebebê pêşketina pisporîya seneta
dirûn û raçandinê, kuloz çêkirinê,
zenbîl çêkirinê û malçêkirinê û her
wisa eva ew bûn ku piraniya caran

mijûlê karê ticaretê bûn.

Ev her wiha dibêje ku civata malbatê
jî jinê pêk aniye û hêdî hêdî navê mîr
jî aniye di nava listeya heywanên kedî
kirî de û ew hinê edeb û hurmetê û
hunera rabûn û rûniştinê û rêzgirtina
civakî kirine.

Bi van serkevînan ku jinê di warê
aborî, malbatî û perwerdehiyê, civakî
û siyasî de bi dest ve anîn, dewranek

di jiyana mirovahiyê de
dest pê kir ku bi navê
serdemê jin serdestiyê
(dayîkşahî) bi nav û deng
e.

Ev serdema piştî
dewranekê ye ku jin û mîr
bi vî yekê ku cehdekê di
warê berhemanîne bikin,
wekhev ji destkevînan
xwezayî xwedî derketine û
destpêka vî demekê de
bûye ku mirov bi karê

cotkariyê û mifah wergirtina pitir ji
erdê nasyar bibe. Bi gotina "Gurdun
Caylid": "Di navbera netewên cotkar
de jin sebebê xizmayetiye ye. Di
jiyana giştî de, karên girîng bi destê
jinan ve tên encam dan, bi vî hîcetê
rola eslî li stû yê wê ye, pîrsa
desthilatê û serve bûna jinê jî her li
vir çavkanî digire".

Di vê dewranê de yekîniya malbatê
ser bi tayîfeya jinê bû, mîr dihate
nava malbata jinê de û li dema bê
şîyanî û hebûna kêmasiyên din de jinê
dikarî wî red bike. Mîr xwe girêdayî bi
eşîra dayîka xwe dihêla. Bi rêvebirina
kar û barên malê û birêxistina karên
berhemanîne li stûyê jinan bûn, xîncî
vê çendê, xwezayê jî çêkirina zarokan
xistibû stûyê jinan. Eva ku ji bo mîr
dima, tenê berevanîkirin ji giştî yanî
malbat û eşîrê li hember erkê jinan
bi vî awayî ku hewce bû, nediyar bû.

Ev nivîsara, kurtiyek ji basa Dayîk
Serdestiyê û sebebên wê bû, di
hejmara tê de em dê ji civaka dayîk
serdestiyê vegezin bo ser civaka bav
serdestiyê û sebebên vî demê bidin
şîrove û dahûrandin.

Jineke Nexedeyî Bi Kevirbarankirinê Hat Mehkûmkirin


Jineke Kurd bi navê **Melek Qurbanî**
ku bi guneha zîneyê hatiye girtin û
niha jî di girtîgeha Urmiyê de ye, li gor
hukmê dadgeha Îslamî ya Urmiyê bi
kevirbarankirinê hate mehkûm kirin.
Ji aliyê din mîr û birayê vî jinê bi

navên **Mihemed Danişfer** û **Ebûbekir
Qurbanî** ku mîrê gumanbar bi zîneyê
kuştine, her yek bi 6 sal zîndanê hatine
mahkûm kirin.

Çavkanî: RMMK.org



Ji Olên Mirovatiyê Ola Konfûşiyos



CANKURD

Li ba Çiniyan **Konfûşiyos** bi "**Şah**" tê navkirin. Ew sala 551'ê berî zayîna hezretê **Tsa** ji dayîk bûye û sala 479'ê ji dinyayê koç kiriye.

Di vê olê de ne Qeşe, ne rabîn, ne pîr û ne mele hene. Kenîse, camî an perestgeh ninin. Dogmayek baweriyê jî tune ye. Ne diroka afirandinê, ne behîşt û ne jî dûjeh, tev Xwedê jî di nav bawerîya Konfûşiyosan de tune ye, tenê pênc armancên zevînê û mirovî hene:

- Maldarî
- Rûmet
- Gelek Kur
- Jînek dirêj û xweş
- Mirinek baş.

Xala giringtir di nasdariyên Konfûşiyos de sîniç e "**Exlaq**" e. Divê ew kesê, ku vê hildigire di jîna xwe ya malbatî û ya civakî de bi xelkê re hevsaz û dirîst be.

Şah "**Konfûşiyos**" dibêje, ku hêza mezintirîn a ezmên û zevînê di pêdakirinê de ye. Her tişt li ser wê avabûye û ava dike. Zevîn tovê dide, ro û baranê jî şîyanê didin.

Ev bîngeha hişmendî û jinparistina Konfûşiyosî ye. Mirov di pirtûkên **Konfûşiyos** de berhemê hevsaiziya ezmên û zevînê ye, li ba wî ne Xwedê, ne jî can û rewan derveyî hişmendîya mirovî hene, lê belê bînesazîyek cihanî heye, wekî di ezmanan de saziyek bîngehîn heye, siruşt jî li saz e. Hema ew nabêje ev hevsaiziya ji kuve hatiye, çawa pêda bûye. Li ba wî civat û jîna kesani jî pêdivê bîngeh û zagonê ne.

Di jîna **Konfûşiyos** de hovîtiyek bê wekanî li **Çînê** hebû, kuştinekê kuştinekê dihanî û tolhildanekê tolhildanekê dihanî. Di navbera du şahdariyan (**Lu û Tsîn**) de neyartiyek mezin û dirêj hebû. Şah **Lu** ji hişmendîya **Konfûşiyos** hezkir û ew kir şêwirdarê xwe, û bi taybet dema wî gotinê wek van gotinên heja dikirin.

[Deban "*silah*" bi xwe re nebaşiyê tînin, evana ne acetên rûmetdaran in, tenê gava çareyek di namîne, mirov dikare wan bi kar bîne.]

[Jiyan qencî ye.]

[Ewê bi hiş dikare serweriyê bike, pêdiviya wî bi çek û debanan tune ye.]

Dawî gava herdu şah (**Lu û Tsîn**) li hev hatine, û jî şah **Lu** re hinde jinên bi evîndariyê navdar bûn û 120 hespên kumêt wek diyarî ji şah **Tsîn** de hatine, şah **Lu** bi wan gero û sermest bû, şalyar û filosofê xwe **Konfûşiyos** jî bîr kir. Wî jî seriyê xwe rakir û jî ba wî koç kir.

Di geriyane de gelek şagird, ji wan (72) peyrewên bijarte ramanên wî li welêt belav kirin, û **Konfûşiyos** bi "**Keyserê fêrkirinê**" hat naskirin. Bi rêya **Mêngst** ê xort û wefadar bir û baweriyên wî hatin hilgirtin û Konfûşiyosî di dewletê de hat çandin û nema tê silkirin.

Tevî ku 50 salî berî jî dayikbûna hezretê **Isa** – *Silav lê bin* – ola **Buda** derket holê, û wek wê jî **Lawtsî** û **Tawîsi** di **Çînê** de xort û bi hêz bûn, lê belê Konfûşiyosî hîn jî, ta niha, çax û damarên xwe berdane nav gelêd **Çînê** û li hember diktatoriya Komonîstiyê berxwe dide.

[Weku di ezmên de royek heye, di malbatê de merek heye, wilo di welêt de jî divê keyserek hebe. Ev histobariya xwe ya asîmanî digire, û lewre bi "**Kurê ezmên**" tê navkirin.]

Mêngst, ku yekemîn şagirdê **Konfûşiyos** bû (371 b.Z.) bir û baweriyên seydayê xwe şirove kirin û asantir belav kirin. Ew dibêje:

[Du zorbazên dema berê hebûn, **Kih** û **Çaw**. Hem deselatdariya xwe û hem jî gelên xwe wînda kirin. Wan gel wînda kirin gava dilê gel jî dest xwe dan. Rêyek heye, ku tu deselatdariyê û gel bo xwe vegeirîni, ew jî rêya dil e.]

Ji kû heya kû



Bêrî Bihar

Ka binihêre!
Ev rê...
Ev rê rêya me ye

Bûye lûsa rawil û sewalan,
Ji fêkiyên nêrit û janên me,
Ji hêvî û ramanên me doşekên sitûr girêdane
Li ser wan mar û düvpişkan pal dane,
Dûyê qelûnên wan bûne ewrên reşgirana li ser baxên me.
Li benda barîna herî bi xişm me teyroka wan î kezeban.

Ka binihêre!
Ev rê...
Ev rê rêya me ye

Ji peşkên barana şerê azadixwaziya me,
Pêlên dijwar yên neyartiyê dizên,
Ji ava zelal vedixwin dostên me!!!
Ew xwarinxurên demekî sifra me ya dewlemendiyê
Şaredariya xwe avakirine li ser qûlpikên têrxwarîne.

Ka binihêre!
Tu nas dikî?
Ev rê rêya me bû

Rêya min û te,
Bûye korç û newal,
Di yek jî wan korçan de veşartî me ez,
Bûne delavokên hûrik di korçan de heştên me,
Weke sêwîstêrkan li hev civiyane.

Dilerizin...
Çawa be jî, ev rê rêya me bû,
Xirab be jî ezê wê biparêzim
bi xwezaya xwe ya jinantiyê.
Çawa be jî ked û xwêdana me rijiyayê.
Bixwazi dîsa were, hewl bide û bimeşe,
Ezê nas bikim pêlkirina te,
Nas bikim ezê,
rêçên te yên nermik
li ser çavên xwe...

BIYANÎBÛN

ADAR JIYAN


adarjiyan@mynet.com

B iyanîbûn, veguherandina derûn û kakilê jiyana mirov a xweser û taybet ku bêhemd li bêahengî,

bêwateyî û jixwebidûrketineke bêyom dadigere ye. Bi vegotîneke din biyanîbûn, mirov ji kirdeya jiyane derdixê û wî/wê wekî biresereke bînîrx û tiştêyî dide bikaranîn û xebitandin.

Kengî ku ber û berhemên ku mirov bi destê xwe diafirîne hin bi hin ji reseniya xwe bi dūr dikevin û ku bedewî û gewzîneriya wan ber û berheman li dijminahî û tēkbirina mirovan dadigerin, wê çaxê biyanîbûna mirov û civakê jî dest pê dike. Û wê gavê mirov û civak dibin dîl û bindestên ber û berhemên ku wan bi destê xwe afirandine. Biyanîbûn, bi awayekî jî bi alozî û tevliheviya pêwendiyên civakî re rû dide. Belê ev geremol û aloziyên civakî ne îro; hê di destpêka xwedîtîyê (mulkiyetê) derketine holê. Xwedîtî, her çend ku çendanî û çawaniya hilberiyê zêde dike jî, xwedîtîya arizî ya ku gihîştîye merhaleya îro, xwezayê û hemû heyberên wê roj bi roj dihelikîne.

Biyanîbûn, di derûniya mirov de, di encama lêkdana hewldanên ku bi mebesta jiyaneke serbilind û rûmetdar dest pê dike û liv û bizavên ku mirov gav bi gav arasteyî bērumetî serberjeriyê dike de pêk tê û teşe digire. Her çend ku rûxinerî, wêrankerî û biyanîbûna mirov a civakî di hemû warên jiyane de pêkan be jî, dîsa cerbirandin û ewezî (xelef) û vegeandina wê tiştêkî gengaz e. Belê çilvirin, kavilkirin û dejenekirina wêjeyê tu car bi hêsayî nayê cebirandin. Û ne pêkan e jî. Ango, bēeslîkirina civak an jî neteweyekê, pêşî bi bişavtin û biyanîbûna wêjeyê dest pê dike. Bi kurtayî jehra biyanîbûn û bēesilbûna civakê, di serî de xwe di wêjeyê de dide der. Peyre jî hin bi hin li hemû rehên çanda gel û civakê belav dibe û wê dîl radest digire. Ji do heta îro- di dîroka wêjeya gelan de- lixwexwedîbûn û jixwebidûrketina mirov û civakê, wekî du dijminên pozber û lēkneker misêwa bi hev û din re şer dikin û dikevin cirê. Her du dijberên qedim û kevna her dem li dij hev belê pevne dijîn. Bi heman awayî jî her gav bi hev û din re dikevin nava rikbariyeke giran. Bi vê lēkdanê dijwar re yek li ya din dadigere. Şerê navbera herduyan dişibe şer û pevçûnên navbera mirovên bilebat û afirîner ên ku puxteya jiyane bidest dixin û kesên tēkçûyî yên ku di nava hevkeşî û aloziyan de winda dibin.



Ev şer û lēkdanên bēnavber car caran li serkeftinê bēhempa û car caran jî li tēkçûnê bēkêr û bēxêr dadigerin. Bi awayekî din, yek yekê winda dike an jî yek yeka din dişibîne xwe.

Mirovahî, digel ku tiştên pir payebilind û qîmetdar diafirîne bi heman awayî gelek tiştên kerax û bêteşe jî dixuliqîne. Ji aliyekî ve di hêla zanist û teknolojiyê de pêşve diçe; şoreş û veguherînên pēmsal bidest dixê û ji aliyê din ve jî nîrx û hêjahiyên dîrokî bi destê xwe jî holê radike. Zimanê ku bi hezaran sal hatiye axaftin, çand û hunera ku dexmeya xwe li dîrokê daye, wêjeya ku bûye ronîdariyên dîrokî û hwd. hemû bi teknolojiya nûjen re hêdî hêdî ji qada jiyane vedikişin û hin bi hin winda dibin.

Mixabin îro ro mirovahî xwe dispêrê civakeke yekpar, bēruh, bēgiyan, bēhest û bēraman. Bi vê yekê re dahatûya cihanê û tevê mirovahiyê dikeve xetereyeke mezin û çarenîn. Lewre mirovahiya ku ji wêje, huner û estetizma giyanî bidûr bikeve, dê tu car nikaribe xwe ji belawat û karesatên vê dinê reha û rizgar bike. Bi vegotîneke din; biyanîbûn li şûna ku mirov her gav bi kesên din re di nav kar û xebatên hevpar û sūdewar de be, hêjahiyên payedar biafirîne; ji aliyekî ve ji reseniya xwe bidûr dikeve ji aliyê din ve jî dikeve nava liv û bizavên pelos û di tevgerên kerih û bêyom de digere. Hêçku wêje, bi hemû lihemberderketina liv û bizavên bêsinc û tevgerên derexlaqî ye.

Biyanîbûn, pêşî bi wêjeyê dest pê dike. Belê pesarî û hovîtiya mirov bi saya şardekirin û perwerdehiyê û her wiha hestên wêjeyî jî holê radibe. Her wiha kemilîn, peresîn û şarezahîbûna mirov a derûnî û ramanî jî dîsa bi saya wêjeyê bi dest dikeve. Wêje, perwerdekirina peyvê, sererastkirina axaftinê, gewzandina hestê, stewardana ramanê û ya girîngtirin jî bedewkirina liv û bizavên mirov e.

Kaniya Helbestan

Letif Epozdemir

EVÎNÊ KUŞTÎN

Dayê baran e
bêhna mirinê tē,
ewr bûne mij û moran,
pêşna qederê tē
Qompare rijijyan
bi hezaran insan
bê nefes û can
li erdê dirêj man.

Jehri dibare
bi bêhna sêvan
reş e asiman
zarok li erdê bê derman.
Gul venabin
piranî zarok in
jehri rijya ser singê wan
mirin e êdî para wan.

Mîrata mirinê
vê carê
bê xeber hat
bi ser me ve girt
bê rehî û eman.
Bayê sibê hê sekînî
Li hawîr bêhna sêvan
sêv ne ew sêvên xwarin ê
lê dermanê mirin ê.

Can westiya
jiyan rawestiya
ax dikele bi xwînê
dawî hat li evînê.
Keçeke çavgeş
di ricife bi girîn
dibêjê hewar e dayê
ez mir im bi vê bayê

Min bixe nava nivîn
ku bikeyê êşa min
qeda bi vê qederê
çî karê me li dinê
Li ber singê kalekî
kûrekî dû sê mehî
di cemide canê wî
lê tuneye çara wî. Mirin hat
mala kir vala
hemû kes bê mecal in
hey dinyaya derewîn
tu binêr ev çî hal e.
Hat karwanê mirinê
di bare jehri li jor
neyar hate xezebê
dîsa bu har û çavsor

Çeprast:

1. Gişt di Farsî de.
2. Berevajiya navê rûbarekê ye di Ewropayê de – Berevajiya navê vê demançeyê ye ku di terora Mikonosê de hate bikaranin.
3. Berevajiya navê bajarekî Îranê ye – Welatekî Afrîqayî ye.
4. Jineke şoreşvan bû.
5. Dayîk di Turkî de – Heke ev peyva bê ducarkirin di Erebi de navê balindeyekê ye.
7. Çiya di Soranî de – Navê darekê ye – Ew jî mirov difetisîne.
8. Serkomarê Turkiyê bû ku hez hez dikir pîrsa Kurd çareser bike – Ew jina Kurd ku serokwezîra Pakistanê bû.
9. Wusa – Berevajî dibêjne mirovên çûr.
10. Muzîkên şoreşgerî.

Serjêr:

1. Şibhigiraveke mezin e di Ewropayê de – Heywanên çoleme.
2. Navê jina Kirîs Kuçîra – Di Farsî de tê wateya **serê**.
3. Di duayan de ev peyva zaf tê bikaranin – Bajarekî Kurdistanê ye.
4. Hekî **K** bihê zêdekirin, navê herêmekê ye di Îspaniyayê de ku daxwaza federalîzma asimtirîk dike – Li jêr ava rûbaran de heye.
7. Navê filmeke Farsî ye – Serkomarê Amerîkayê bû.
8. Hunermendeke Fars e ku di opêrayê de kar dike – Heke **T** bihê zêdekirin, di bihiştê de heye.
9. Navê mêra ye – Hekî **T** bihê zêdekirin, navê Serkomarê Yûgîslavîyê bû.
10. Di Farsî de tê wateya nexweş – Ew jina ku çalakvana siyasî ye û eva 16 sal e ku di hepsê de ye (bi xwe jî xelkê Birmê ye).

Bersiva Xaçepirsa Hejmara 41'an

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	O	M	E	R	X	A	W	E ₆	R	
2	Ş	î	M	A		S	A	B	A	T
3	î	B ₂	î	M		A	N	A	M ₃	A
4	N		D		X					
5		D		H	U	Y ₅		î	D	Z
6		M		U ₄	F	A		D	P	A
7	N		R		U					
8	R	U ₁	D	Z		R	Ê	W	A	S
9	Û	N	E	R		O	M	A	T	A
10	H	E	S	E	N	S	E	B	A	

Peyva veşartî ○ ○ ○ ○ ○ ○
1 2 3 4 5 6


Bersiva Sudoku a Hejmara 41'an

3	7	1	6	8	5	9	4	2
6	9	5	7	2	4	1	3	8
8	2	4	9	3	1	5	7	6
7	1	9	5	6	8	3	2	4
5	8	3	2	4	9	6	1	7
2	4	6	1	7	3	8	5	9
9	6	7	3	5	2	4	8	1
4	3	2	8	1	6	7	9	5
1	5	8	4	9	7	2	6	3

Xaçepirs

Amadekar: Sehab Xalidî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1										
2			O ₄							
3										
4									O ₂	
5			O ₃							
6										
7										
8										
9										
10										O ₁

Peyva veşartî

Sudoku

		4	7		5	6	8	
	8	6				3	7	
3	7				1		9	
8			6	4				
			2	8	3	1	6	4
4		2		1	7		3	
6	5			7		9	4	8
7	3	9		5	8	2	1	6
				9		7	5	

Ji bo serrast kirina "Sudoku" wan xalên jêrîn li berçav bigirin

1. Hejmarên 1-9'ê di rêza serjêr de dubare nabin.
2. Hejmarên 1-9'ê di rêza çeprast de dubare nabin.
3. Hejmarên 1-9'ê di nava stûneke 3×3 de dubare nabin.

Di Dadgeha Mafê Mirovan Ya Ewropayê De Dewleta Turkiyê Mehkûm Bû

Li gor Ajansa nûçeyan ya "AFP", Dadgeha mafê mirovan ya Ewropayê

dewleta Turkiyê mehkûm kir.

Li gor rapora "AFP", Dadgeha mafê mirovan ya Ewropa roja sêşem 27.06.2006'an Turkiyê mehkûm kir û da zanîn, liv û riftara Turkiyê derheq 4 girtiyên ku ketibûne gireva birçibûnê, reftarek ne mirovane tê hesabandin.



Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropa di hukmekê de ragihand ku li gor berçavgirtina rewşa wan girtiyên û nebûna delîlveya wan girtiyên ev gava Turkiyê berevajî xala Sêyan ya Konvansiyona mafê mirovan ya Ewropa tê hesabê ku reftarên nemirovane qedexe dike.

Li gor vê raporê, van 4 girtiyên ku du ji wan canê xwe ji dest dane, li meha Septembra 2000'an ji bo nişandana nerazîbûna xwe li hember qanûna nû ya girtigehan, ketibûne gireva biçûbûnê û zêrevanên zindanî jî bi vê hêcet û mihanê ku ew dixwazin birevin, her çar girtî li textê nexweşxanê girêdabûn.

“Qasimlo Le Rêbazî Da Zîndowê”

Pirtûka “Qasimlo Le Rêbazî Da Zîndowê” (Qasimlo di

rêbaza xwe de zindî ye), hîlbijartiyek ji nivîs û wergerandinên birêz

Qadir wirya ye li ser kesayeti, tekoşin, raman û dîtinên Dr. Qasimlo.

Pirtûk ji destpêkek û çar feslan pêk hatiye. Beşa yekem pêkhatiye ji hîlbijartiyek ji nivîsên Qadir Wirya li yad û bîranîna Dr. Qasimlo de. Fesla duyem ji çend gotûbêj û gotarên Dr. Qasimlo pêk hatiye. Fesla sêyem li ser gotin û bir û rayên kesayetiyên cur bi cur e li ser Dr. Qasimlo. Fesla çarem ji bo gotar û mijarên pêwendîdar bi dosya terora Dr. Qasimlo hatiye terxan kirin. Pişka dawîn ya pirtûkê jî




albûmek ji wênayên Dr. Qasimlo di xwe de cih dide. Pirtûka navhatî ji 294 rûpelan û ji aliyê dezgeha weşan a “Awêr” li Hewlêr hatiye weşandin.

Desteya Nivîskar ya Agirî bona vî karê piroz, mandînebûn û destxweşiyê ji kekê Qadir Wirya dike û jê re hêbiya serkevtinê dixwaze.

Zanist û Teknoloji

Ip Telefon, Xerca Telefon Kirinan Heta Nîvê Dadibezîne

Hamid Durûdî



Kovara “PC fôr Alla” ku li li welatê Swêdê derdikeve, ceribandinek li ser panzdeh cihan di pêwendî tevî telefon ji rêya hêla pan ya internetê de pêk aniyê. Di encam de “Phonzo” ji hemûyan çêtir û erzantir û kompaniya mezîn ya “Telia” wekî şirketa herî nebaş û giran hate naskirin. Niha êdî bona vê çendê ku ji rêya internetê telefon bihê kirin, ne hewce ye kompyuter were bi karanîn, niha alaveke nû û biçûk derketiye ku di navbera pirîza hêla internetê û telefona normal ya malê de tê girêdan û bikarîner her wekî caran telefonê dike, lê êdî weke caran aboneya telefonê nade.

Piraniya ew kesên ku ji bo vê ceribandinê bi wan re hatiye axavtin, dibêjin heta seh bi vê çendê nekirine ku ji rêya internetê ve telefon kirine. Cudahiya van cure telefon kirinane tevî sistema belaş ya “Skype”ê eva ye ku telefona internetî wekî wê bi tevahî ne belaş e.

Bi giştî heke ji rêya telefonê ve telefon bihê kirin, tevî telefonkirinê bi awayê asayî xerca mehane ya telefonê, hetanî nivê kêmkê dibe. Başîyeke din ya wan cure hêlane eva ye ku bi ciheke taybet ya coxrafî ve pabend û girêdayî ninin û mirov dikare bi hemû hêleke internetê li seranserê cihanê de girê bide, bi awayekê ku ew kesên niştêcîhê welateke din in yan ji bo sefera havînê ji bo welateke din diçin, dikarin telefonên xwe bi heman hejmar telefona welatê xwe bi xwe re ji bo ciheke dilxwaz bibin.

